ÎRAN DÛ FELQ ?!...

Ti pêşbînî kes ne dikir bo hilbijartinên serok komaryê li Îranê ko hewqas bi jînderwarî be û cemawer biçin ser qotîkên dengdanê.
Ti pêşbînî nebû ko encamên wê bi rûdanên diramatîk di qada ramyarî,civakî de bo komara Îslamî berz bibe.Bi taybetî di qada meşê de rûdanên lêdan û koştin rûbidin di meydana Azadî de.Yekemîn care ji 30 salî,ji temenê komara Îranê ya Îslamî de ko wek ev xwepêşandanan pêktên û pirs tê kirin ko çi cudahî nabera van xwepêşandanan û yên sala 1999,2003 de heye?.
Îro em li ber tevgerek xwepêşandan ji ciwanên vî welatî ne,li dij sînorkirina mafên civakî û ramyarî ne ,li dij pêlkirina mafê netewên ne Faris ,nebûna azadiya peyv û raman , herikandina miloyonan ji dolaran ser partiya Huzbu alah û Hemas li Gaza yê, hişt hildana dengan ji alîyê ciwan û navendên bilind çi navendên çandî û bazirganî bilind bibin ji civaka Îranê. Tevlî ko tê nîşandan ko sedem encamên hilbijartinê ye ko pê hatiye lîstin û bi taybetî li paytextê rûdan dide ko xwedî 15 melion rûnişţvan lêne bi piraniya wan pişţgirên M.Mûswî ne.

Ji zarokên şoreşa Îslamî ko sala 1979 rûdabû li dijî rêjîma Şahînşah,îro rêvebirya van xwepêşandanan dikin û pir sedem hene bi dirêjbûna 30 salên ji pêlkirina mafe netewan û ne bûna azadya raman,çapemenî û qedexkirin zaskirina partî û destgehên civaka bajarvanî,destberdan hezên ewlîkarî ko hezên dijber ji kokê rakin.Wisa jî sedemên wek bilindbûna hejmara hemwelatiyan,bê karî ,gandalî ,nebûna di aboriyê de sermeyana beyanî û ne li hevkirina nabera pirbûna rûnişţvanan û hatûder de li wekatkî ko hejmara ciwanan dighê 60% .

Bi peyvek din îro Îran dû felqe yek jê cûtyarî ye ,mûhafezekare ko pişgirya hikûmet û destgehên wê dike û bê guman pişgirya A. Nejad dike.Û Îrana ji çînên bilind di nav de dewlemend,rewşênbîrî û reformxwazan(guherxwaz) û ji gelek navendên olî pêk tê û ne seyre ko ev xwepêşandanan li Tahranê wek peytext ev bûyer rûdide.

Ev dijberiya li dij encamên hilbijartinê ko ciwan pêşengiya wê dikin ne bê serî û navenda ramyarî ye,ne tevgerek lihevketî û bê hoşmendî û bê hestîyên ramyarî ye.Ev raperîna cemwere,xwedî rêvebiryek guherxwaz bi havilek şoreşgerî bi seroktiya M.Mûsewî ye.Em ji bîrnekin ko pir ji zilamên di rêza yekem de, di şoreşa Îsalamî bi rêvebirya A.Xûmeynî wek Refsencanî,Mûhsin Rajayî pişgirya xwe dane Mûsewî ko bi xwe Azerî ye,(hejmara Azerî dighê 24% ji seran serî Îranê tevî) û ji bajare Qomê ye,ev bajar wek navend û lêvegera Musilmanên Şîyî li cîhana îslamî de payebilinde.Guman bi encamê hilbijartina ne tenê di kolanan de ye, lê di nav pir hezên ramyarî deye ko metirsîna xwe nîşan dikin ji dîktatoriya A.Nejad.

Ev çend rojin ji van xwepêşandan ko berdewam dibin û kes nizane pêşeroja Îranê bi kû ve diçe nemaze paş gotara olî ya roja Înê mûrşidê herî bilin A.Elî.Xamneyî gava ragihand ko hemû guman di encama hilbijartinan de derw in û li A.Nejand xwedî derket û got berdewamkirina xwepêşandan dikeve warê neyartî li dijî şoreşa Îslamî û pirînsîpên wê.Şaşe ew kesê bêje bahozeke ew ê derbas bibe û encam çibe û kî bibe serok dibêjim ko Îrana berî hilbijatinan ne wek Îrana paş hilbijartina ye ,Îran bû dûfelq û ew ê bimîne nav bê aramî ye de… sobanî bike .

Bêkes Têlo
bekes_tello@hotmail.com